

Bona azadî, aşîti û bîzatiyê!



DENGÊ KURD

Helmar No 11
25'1'one, sala 1997
Ji c'liaye' pas'in, sala
1992-a te' we...

Fonda C'anda Azerbaycanê
Navgîna C'anda Kurd "Ronayî"

Азербайжан Мәдәнијәт Фонду
"Ронаји" Курд Мәдәнијәт Мәркәзи

Азербайджанский фонд культуры
"Ронайи" Центр курдской культуры «Ронайи»

BILA SALA XWENDINÊYE NÛ PIROZBE!

Dersdar u şagirtên hêja! Hê mecal tune, weki alfabê bi zimanê kurdi bê weşandin. Lê kandidatê ulmê pêdagogiyê Bayramê Feti spartina (nişankirin) dersa nivisiye, Adilê Cemal rêdaktori lê kiriye. Ev spartina ji aliye Instituta pêdagogiyêye ulma ya rêspublika Azerbaycanêda hatiye tesdiq kirinê. Bi şewra wan ev spartin rojnamêda tê weşandin. Li rêspublika Azerbaycanê wan mektebada ku dersên zimanê kurdi derbaz dibin, dikarin ser himê wê spartinê dersa derbazbin.

BERI HINBÛNA ALFABÊYÊ

DERSA 1-ê

Nasî. Dersdar berê nasiya xwe dide şagirtan. Paşê navê wan, navê bav û paşnavê wan pirs dike. Şagirt hîn dibin, wekî bi zimanê kurdi çawa gazî hev dikin: Eliyê Hesen, Hejarê Şemo, Gulustana Huseyn, Perîşana Mehmed.

Vê dersêda dersdar derheqa zimanê kurdi û gelê kurd kurt qise dike.

DERSA 2-a

Dersdar derheqa mektebê, xwendinê, dersxanê qise dike.

Şagirt ser himê wênan bersiva pirsêd dersdar didin: Eva çîye? Şagirt çî dikin? Dersdar çî dike? Nivîsarê li ser çî dinivîsin? Bi zimanê azerbaycanî dersdarra çî dibêjin? Lê xwendin û nivîsarêra çî dibêjin?

DERSA 3-a

Vê dersêda dersdar ji yekê heta deha jimarê hîn şagirtandike: 1-yek, 2-du, 3-sê, 4-çar, 5-pênc, 6-seş, 7-heft, 8-heyst, 9-neh, 10-deh.

DERSA 4-a

Dersdar derheqagund, malhebûnagundîtyê, dor-berê gund qise dike û pîrsa dide şagirtan. Şagirt ser himê wênan û dinêdîtina xwe bersiva pirsêd dersdar didin.

DERSA 5-a

Vê dersêda ser himê wênan navê heywanên kedîkîrî (malê) û beyanî tî hînkirinê: çêlek, gamûş, hesp, pez, bizin, mîrîşk, qaz, werdek, hîrc, gur, rûvî, teyr, kund, quling...

DERSA 6-a

Berê ser himê wênan navê reza: sêv, hurmê, hinar, zerdele, tîrî tî hînkirinê. Paşê dersdar derheqa wanda pîrsan dide şagirtan. Bi zimanê azerbaycanî sêvêra çî dibêjin? Hurmêra çî dibêjin? Li gundê wêda kîjan darên reza gellekin?

WEDÊ HINBÛNA ALFABAYÊ

DERSA 7-a

Herfa A a

Vê dersêda ser himê wênan giliyêd "a", "aş", "av", "agir" û yêd mayî tî hînkirinê. Paşê şagirt rastnivîsara "A" û "a" hîn dibin. Pey vê hînbûnêra dersdar pîrs dike. "Navê kê bi herfa "A" destpêdike?"

Vê dersêda usa ji dersdar fîrqiya sewtan û herfan şirovedike. Gili ji sewtan tî hînkirinê. Em sewtan dibihîzin, lê bi çavên xwe nabînin. Sewtan bi harfan dinivîsin, lema ji em herfa bi çavên xwe dibînin.

ЈЕНИ ДӘРС ИЛИНИЗ МУБАРӘК!

Ики илдир ки, курд дилиндә "Әлифба" вә "Методик кәстәриш" чап үчүн һазырдыр. Лакин онларын бу вахта гәдәр чап едилмәмәси курд дилинин тәдрисиндә бәјүк чәтинликләр тәрәдир. Бу чәтинлији гисмән арадан галдырмаг үчүн Азәрбајчан Дәвләт Пәдагожи Елми Тәдгигат Институтунун мәсләһәти илә курдчә "Методик кәстәриш"и дәрч едирик.

"DENGÊ KURD"

DERSA 8-a

Herfa V v

Gili: varik, vizik, vëdro, sêv, hîv, lêv, dev...
Xwendin: av, ava.

DERSA 9-a

Herfa Ee

Gili: elek, emenî, elegez, enîşk, Erez...
Xwendin: Ev. Eva. Eva ave.

DERSA 10-a

Herfa B b

Gili: beran, bilûr, berf, berx, bahîv, benîşt...
Xwendin: Ba. Bav. Bava. Eva bave. Bava bave.

DERSA 11-a

Herfa Ş ş

Gili: şe, şûr, şer, şel, şekir, şûşe, şerbik, şîlan...

Xwendin:

şa	aş	Aşe,	aşe
şe	baş	Eva	aşe.
şes	baş	Baş,	baş
şev	şas	Bava	baş.

DERSA 12-a

Herfa Ū ū

Gili: ūtî, dū, mū, gūz, dūv...

Xwendin:

şûşe	av ū aş	Bav ū Baba
şûşa	şe ū şûşe	şûşa ū şûşe

DERSA 13-a

Herfa M m

Gili: meqes, mer, mişk, mêzer, morî, mor, moz...

Xwendin:

ma	maş	Bava ū Şemam
mū	mūm	şûşe ū maşe
me	ma-şe	Mūm ū mū
em	Şe-mam	Şemam, eva mūme?
-Eva mūme.		-Eva mūme.

DERSA 14-a

Herfa K k

Gili: kew, karî, kundir, kar, kevir, kod...

Xwendin:

ka	meşk	meşk ū keşk
kem	keşk	mak ū bûk
mak	bûk	ka ū kem.

-Şemam, eva meşke?

-Eva meşke.
-Bava, eva keşke?
-Eva keşke.

DERSA 15-a

Herfa Ê ê

Gili: şêr, mêr, kêr, zêr...

Xwendin:

mê	mêş
vê	Me-mê
bê	Şe-mê

-Şemê, eva ave?
-Eva ave.
-Memê, eva mêşê?
-Eva mêşê.

DERSA 16-a

Herfa N n

Gili: nan, name, neynik, nêrt, nîsk...

Xwendin:

na	ban	aş-van	Nan ū av
ne	man	mê-van	Aşvan ū Şemam
nan	van	şe-ne	Nenê ū Şemam
nav	şên	Ne-nê	-Nenê, eva nane?
			-Na, ne nane.

DERSA 17-a

Herfa Î î

Gili: îro, îsal, derî, kerî, mî...

Xwendin:

vî	îş	ka-nî	Memê, Emîn ū Emîne
bî	nîk	ba-nî	Memê mî anî.
mî	înî	E-mîn	Emîn ka anî.
bîn	şe-mî	E-mî-ne	Emîne av anî.

DERSA 18-a

Herfa L l

Gili: lepik, legleg, lempe, lod, laçik...

Xwendin:

lê	al	be-lek	şî-lan
lêv	kal	e-lek	lê-lê
lîl	şal	be-la	leme-lem
mîl	mal	ke-la	Me-lek
lan	kel	be-lê	Şa-mîl.

Mala me bal mala Şamîle. Lê mala Şamîl bal aşê.
-Lêlê, Melek, Şamîl male?
-Belê, Şamîl male.

DERSA 19-a

Herfa G g

Gili: ga, glîzêr, gakuvi, gur, goşt, gamûş, gore, genim...

Xwendin:

ga	beg	ga-van
gav	belg	ga-mûş
gem	bang	ge-lî
gel	bal-gî	gel-lek

Şamîlê gavan
Şamîl gavane. Gavane ga ū gamûşane. Şamîl gavanekî gellektîbaşê.

(Peyhatin rûpêlê 2-a)

(Destpêbûn rûpêlê 1-ê)

DERSA 20-a

Herfa O o

Gilt: ode, orxan, once...

Xwendin:

go	gol	lo-lo	Ba-lo
lo	kon	Şe-mo	Ne-vo
gom	şov	Me-mo	Ne-mo

Şemo, Memo û Nemo

Memo got: -Lolo, Şemo, eva konê Şamîle?

Şemo go: -Na, lo, eva ne kone Şamîle,

Nevo go: -Memo, konê Şamîl bal konê Emîne.

DERSA 21-ê

Herfa R r

Gilt: şêr, kar, dar, ardû, arav, ro, rûn, rûvî, reşêlê, rê...

Xwendin:

ar	mêr	ber	morî	Nû-rê
ra	ro	ren	mer	ro-a-va
bar	şîr	bê-rî	ba-ran	Ka-rê
kar	şûr	ka-rî	Ba-rî	Nî-gar.

Barî û Nûrê

Barî kar û karî anî.

Nûrê go: -Barî, eva kare?

Barî go: -Erê, Nûrê, eva kara kevere.

Nûrê go: -Lê evana karîne?

Barî go: -Erê, evana karîne.

Nûrê gellektî şa bû.

DERSA 22-a

Herfa D d

Gilt: dar, dik, das, derî, derdan, derzî, ders, dev...

Xwendin:

da	dar	do	bend	de-rî
de	dêm	don	ar-dû	Dîl-ber
dî	dîk	lod	da-nî	De-lo
dê	dev	kod	der-dor	Be-do
dû	dûr	nod	der-dan	Na-do.

Dilber û Nado

Dîk bang da. Dilber û Nado rabûn. Dilberê derdanek ava kaniyê anî. Beroşek danî danî.

Nado ardû anî.

Nado go: -Lêlê, eva daniye?

Dilberê go: -Erê, Nado, daniye.

DERSA 23-a

Herfa H h

Gilt: hêk, hîv, hesp, hêlîn, hevîr, hinar, hene...

Xwendin:

ha	hot	hîm	meh	he-val
hê	hûr	hêk	deh	hevîr
ho	hîv	neh	hev-de	He-karî.

Hêlîn û hêk

Nado û Bedo hevalê hevîrê. Havîn bû. Her alî hêlîn bû. Rêda Nado go:

- Bedo, hêdî, eva hêlîne.

Bedo go:

-Hêlînêda hêk hene?

Nadogo:

-Erê, hêlînêda neh hêk hene.

DERSA 24-a

Herfa I i

Gilt: bizîn, tîrî, golik...

Xwendin:

bi	şî l	şî v	ke-vî r	bi-ra
dî	mî l	bî r	lî-va	bi-vî r
il	dî l	mî n	hî-rî	bi-lî l

Kinoyê bilûrvan

Biro û Kino birane. Biro şivanê mîyane. Lê Kino bilûrvane. Kino bilûrê rînd lîdîde. Gava Kino bilûrê lîdîde dilê merivan şa dibe.

DERSA 25-a

Herfa Ç ç

Gilt: çadir, çakûç, çînar, çay, çêlêk, çav, çivîk, çîra, çîya...

Xwendin:

ça	çî	çar	çav	La-çîn
çê	çî l	çam	çem	Çî-nar
çî	çî l	çok	çek	Çî-lê
çû	çol	çî-le	çî k	Ço-lo

Çîlê û Çolo

Çîlê çû kaniyê. Çolo çû derdanek av anî. Çolo çîl-çop anî.

Çîlê go: -Çolo, evana çopê dara çamêne?

Çolo go: -Na, ne çopê dara çamêne. Evana çîl-çopê

çolêne.

DERSA 26-a

Herfa S s

Gilt: sêv, sol, se, sîr, silmask, sûk...

Xwendin:

se	sar	sal	si-bê	Si-nê
sê	sêr	sed	so-sî n	Si-sê
sî	sîr	sûk	si-l-mask	So-no
so	sor	sîs	av-sîr	Na-so.

Sînê, Sîsê û Sano

Sîbe bû. Sînê, Sîsê û Sano rabûn. Sînê çû sê derdan av anî.

Sînê avîr danî ser agir. Sano sûsa dor-berê sîrê çî-nî.

Sînê go: -Sano, here sêva beravke. Sano çû sêvê ser darê beravkir. Sînê sê sêv da Sîsê.

Sîsê go: -Sano, evana sêvê sîkêne?

Sano go: -Na, sêvê dara mene.

DERSA 27-a

Herfa T t

Gilt: tîrî, tas, tav, ta, to, tîrşo, tevşo, târ, tar, tî...

Xwendin:

ta	tav	ta-ne	tî r-şo	To-sî n
te	ter	teng	tev-şo	Ta-har
tê	tîr	ta-rî	ta-vî	Tî-tal

Tahar û Tital

Tahar û Tital birane. Tahargavane, lê Tital traktorvane. Lê xûşka wan Terê teşîrêse. Taştê şûnda Tahar tane bire çêre. Lê Tital traktorêva çû deştê. Ro çû ava, tarî bû. Tahar hate mal. Bavê Tahar got:

-Te tane anî?

Tahar go: -Erê, min tane anî.

Bavê got:

-Lê Tital çima nehat?

Tahar got: -Tital hê şov dike.

DERSA 28-a

Herfa Z z

Gilt: zebes, zîn, zerdele, zevî, zengil...

Xwendin:

za	zar	ez	zi-rav	Bar-za-nî
zû	zêr	bez	der-zî	Na-zê
zo	zêr	Erez	ke-zî	Zî-nê
zar	zîv	be-raz	Za-har	Zerê

Zozan

Havîn bû. Gellekt germ bû. Vîze-vîza vizîkan bû. Zerê zararagot:

-Zû bikin, hazîrbîn, emê îro herîne zozanê.

Zînê û Nazê şa bûn. Lê Zahar got:

-Ez naçîme zozana, ezê li mal bîmînîm.

Zînê û Nazê çûne zozanê, lê Zahar ma. Çendektî şûnda Zînê û Nazê Zaharra sosîne zozanê şandin. Lê Zahar zarara zembîlek zerdele zer û çend zebes şand.

DERSA 29-a

Herfa P p

Gilt: pîlîng, pîvaz, pamîdor, penîr, pîşkî, perde...

Xwendin:

pê	pa	pêr	pez	penîr	hesp
pî	pê	paş	poz	pî spor	zîpî k
pîrr	por	pêş	parî	pêçî	lepî k
par	pî r	pîl	parzûn	ap	sî pî ng

Pîrîk û Nazê

Payîz bû. Nazê çû mala pîrîkê. Pîrîkê Nazê paçkir û bire mal. Pîrîkê parî nan, penêr, pamîdor, pîvaz û pîng danî ber Nazê. Nazê pîrîst:

-Pîrîkê, eva penêrê çêlêkane?

Pîrîkê got:

-Na, penêrêpêze.

Pîşkêke rînd malda bû. Nazê parî penêr da pîşkê.

Nazê panzde şeva li mala pîrîkê ma.

DERSA 30-i

Herfa Y y

Gilt: yek, yaştîk...

Xwendin:

ya	yektî	beyar	mey	Leylê
yan	yekser	şîyar	pey	Seyran
yek	teyr	çîya	çay	Seydo
yekbûn	peya	Beyaz	hey	Teyran

Teyran û Seydo

Teyran û Seydo dostin. Rokê Teyran û Seydo hespan şîyar bûn, berbî çîya çûn. Rêda Teyran pîrîst:

-Seydo, eva çîye?

Seydo'nîhêrî û berbîv da:

-Eva teyre, teyrê çîyane.

Seydo peya bû û berbî teyr revî. Teyran got:

-Dest nedê, teyr birîndare.

Baskekî teyr şîkestîbû. Teyran teyr hêdîka hilda û anî mal. Li mal Teyran baskekî teyr girêda. Çendektî şûnda Teyran teyr berbî çîya berda.

DERSA 31-ê

Herfa X x

Gilt: xezal, xaltîçe, xurme, xanî...

Xwendin:

xa	xal	xort	bext	Naxçî van
xar	xaltî	xûşk	berx	Zelêxan
xav	xanî	nexş	Yêvlax	Xezal
xet	xaltî	text	Xezar	Xelîl

Xelîl û Xezal

Xelîl û Xezal xûşk û birane. Xelîl berxvan, Xezal doxtîre.

Xûşk û bîra sibê zû rabûn. Xelîl berx bire berpalê. Berpal mîna xaltîya rengîn bû. Xelîl gellek xaxaşk beravkir. Ro çû ava. Xelîl berx anî. Hinekî şûnda Xezal hate mal. Xelîl xaxaşk da Xezalê pîrîst:

-Xezal, te îro çî xebat dikir?

Xezalê got:

-Ez îro nobedar bûm.

DERSA 32-a

Herfa C c

Gilt: cêr, cot, carcîm, ceh, cûcîk...

Xwendin:

co	cêr	conf	Gence	Casî m
cî	cî vat	cîran	Azerbaycan	Cemal
ceh	cêndûk	camêr	Celîl	Celal
cî l	cûcî k	cî mî me	Cemîle	Hecer

Cemîle û Hecer

Cemîla Casîm û Hecera Celîl cîranin. Cemîlê û Hecerê pîncar bîcer kirin. Isal cara çarane Cemîle û Hecer pîncarê zêde berav dikin. Timê Cemîlê û Hecerê dîspesînin...

DERSA 33-a

Herfa U u

Gilt: gur, guş, hurme, kundîr, guh...

Xwendin:

usa	gurz	gurçî k	kurebeşk
Gullstan	dudu	xurçî k	kurmanç
Gulîzer	kund	kundî r	kundî
Gulnaz	kulav	kurt	kurm
Gulperî			

DERSA 34-a

Herfa W w

Gilt: wawîk, werdek, warîs, wêne...

Xwendin:

we	war	dew	xwarî n	Wer-
dek	wêne	welat	xwendî n	Kewê
wî	kew	warîs	Wezîr	Ce-
wê				
gerxwîn				

Kewê û Werdek

Kewê û Werdek xûşkin. Sibê zû ewana rabûn. Nan xwarin, çay vexwarin û çûne kewşen. Kewê deng bîhîst û wêda revî. Li ber kêvir hêlîn hebû. Hêlînêda çend cûcîk hebûn. Kewê gazî Werdekê kir:

-Werdê, hela werê bînhêre evana çîne?

Werdek hat, hêlînê nihêrî û got:

-Evana cûcîkê kewane.

Kewê xwast cûcîka hilde. Lê Werdekê nehîşt û got:

-Meriv destê xwe nade cûcîka, ew gunene.

DERSA 35-a

Herfa F f

Gilt: fîq, fîl, firinde, fîno, fêkî...

Xwendin:

fêz	fî re	koff	Fetî
fîno	fera	soff	Ferîde
fesal	fêkî	neft	Fî lîl

Fîlîtê firindevan

Fîlîtê Fetî hê zar bûnê mîtale dikir: "Gelo, firinde çawa difire?"

Mektebêda Fîlît zû-zû pîrs dîda dersdara:

-Meriv çawa dikare bive firindevan?

Niha Fîlît tî firindevane. Ewî xwendîna bilind kuta kirîye.

Fîrînda Fîlît nava Bakûyê û Yêvlaxêda difire.

(Peyhatin rûpêlê 3-a)

(Destpêbûn rûpêlê 2-a)

DERSA 36-a

Herfa J j

Gilt: j, jî, jakêt...

Xwendin:

jê	jêr	ji mar	hejmar	berroj
ji	ji r	ji yn	bajar	bi jare
ji	ji n	bejn	mêjû	jajerûn
jan	jar	kejî	roj	Hejar

JINÊN KÛRDAN

Jinên kurdan bi nav û dengin. Rewşa jinên kurdan kofî-kitanin. Dêre û mêzerê jinên kurdan mîna kulîkê baharê reng-rêngine.

Jinên kurdan him bermalî, him jî şervanin. Rojêd şêr jinên kurdan jî mîran paşda naminin. Dîroka mîletê meda navê gellek jinên mîrxas hene. Lema jî dibêjin: "Şêr şêre, çî jine, çî mîr".

DERSA 37-a

Herfa Q q

Gilt: qaz, qulung, qelem, qet...

Xwendin:

qaf	qenc	si lq	qîçî k	Qero
qat	beq	soqaq	qî rş	Qaso
qet	baq	qerqaş	qafî	Qazê
qest	fîq	qî jî k	Feqî	Qerqaş

Qaze û Qaso

Qazê û Qaso xûşk û birane. Sibê zû Qazê got: -Qaso can, here hinek qîrş beravke. Qaso rabû qet hilda û çû daristanê. Qaso piştî qîrş û baqe kulîkê qîçî beravkir. Ji dora golê qamûşek çîni. Qaso hate mal û kulîk da Qazê. Qazê got: -Zef razîme, Qaso can, Lê ev qamûşa bona çîye?

Qaso bersiv da:

-Ezê ji qamûş xwera fîqê çêkim.

DERSA 38-a

ALFABÊYA KURDÎ

Aa, Bb, Cc, Çç, Dd, Ee, Êê, Ff, Gg, Hh, Ii, Jj, Kk, Ll, Mm, Nn, Oo, Pp, Qq, Rr, Ss, Şş, Tt, Uu, Üü, Vv, Ww, Xx, Yy, Zz.

WEDÊ PEY HINBÛNA ALFABÊYÊ

DERSA 39-a

ZIMANÊ KURDÎ

Bi xemil, rewşê,
Şîrî û xweşê,
Zimanê kurdî.

Bi nexş, awazê,
Lêf û naze,
Zimanê kurdî.

Beyta Feqîye,
Sewta Xaniye,
Zimanê kurdî.

Şûrê Şêrane,
Nûra Şêrane
Zimanê kurdî.

Şikoyê HESEN

DERSA 40-i

ŞAIRÊ EYAN

Gellek şair û nivîskarên kurdî eyan, bi nav-deng hene. Yek jî Cegerxwîne. Navê esîf Şêxmûse. Lê dibîne halê gelê pîrr girane, navê xwe dîguhêre datîne Cegerxwîn.

DERSA 41-ê

EM KURDIN

Em kurdin,
Eslê şêranin,
Yek hêjayî
Sed mîranin.

Em kurdin,
Kurdê mîrxasin,
Welatê xwe

Yek dixwazin.

Em kurdin,
Kurdê nav û deng,
Bona welat
Tim dîkin ceng.

Bayramê FETI

DERSA 42-a

ŞÊR Û MIŞK

Lana şêr û qulka mişk rex hev bûn. Şêr usa qure-qure dîqû-dîhat qe binê piyê xwe ne dînhêrî.

Rokê wextê şêr hat derbazbe here, mişk kete nava lepê wî. Şêr xwast mişk bihincirîne, mişk got:

-Mîn azake, ezê rojekê kêrî te bîm.

Vê demê bû pîrçe-pîrça şêr, kenîya. Usa kenîya, wekî çok lê sist bûn, mişk jî nava lepê wî derket, revî.

Çendekî şûnda nêzik qulka mişkê zarîna şêr hat. Mişk bi tîrs serê xwe derxist û nihêrî. Nihêrî. Nihêrî.

Mîna nexweşê heft salan zara-zara şêre. Mişk nêzik çû, dît ku şêr ketîye dawa nêçirvan. Mişk pîrî:

-Şêro, birako, çî bûye?

-Ez ketîme davê - şêr postêde-postêde bersiv da.

-Qe belengaz nebe, - mişk got, - ezê te xilazkim.

Mişk kindirê davê bi diranê xwe qut-qutî kir. Şêr jî dawa piyê xwe kevîrekî xist, dav hûr-hûrî bû. Şêr aza bû.

Wê şûnda herro şêr hatinê jî, çûnê jî serê xwe mişkra berjêr dikir.

Yek-yeke, dudu-komeke.

DERSA 43-a

KURDISTANA KURDAN

Pîr şîrî û rîndî,
Tew bajar û gundî,
Kurdistan, Kurdistan,
Kurdistan kurdan.

Em agîtî xwazin,
Şev û ro ranazên
Dijminê koledar,
Bijî proletar.

CEGERXWÎN

DERSA 44-a

TEYRÊ WELATHIZ

Nêçirvanek rokê diçe nêçirê. Dînhêre li kêleka kevîrekî teyrê ketîye û nikare bifire. Nêçirvan teyr hil-dide, dînhêre baskê wî şikêstîye. Ew teyr tîne mal, baskê wî girêdide, jêra qefesekê çêdike.

Nêçirvan bona xwerinê çîqas tîstê rind hene dide berteyr. Lê teyr dîsarazînamîne, dibêje: "Ax, welat, wax, welat". Nêçirvan teyr di be li çîyê ku hîlîdabû berdi de.

Teyr berbi çîya difire û dibêje: "Oxweş, welat, oxweş, welat".

Welat jî hemûya şîrîne.

DERSA 45-a

Azerbaycan

Êl dizane tu ya minî,
Cî-warê min, dînya minî,
Welatê min, dîya minî,
Tuyî mîna him ruh him çan
Azerbaycan, Azerbaycan!

Tu minra dê, ez tera zar,
Ewled bê dê nabe tu car,
Kuda herim nakim sîtar,
Dîsa minra hewar tuyî,
Roj û rozgar, cî-war tuyî!

Semed VÛRGÛN

(Wergerand Bayramê FETI)

DERSA 46-a

BAKÛ

Navê respûblikame Azerbaycanê. Bakû serbajarê Azerbaycanêye. Ew bajarê bedew û mezin rexbera Xezêrêye. Fabrik û zavodê Azerbaycanêye here mezin li bajarê Bakûyêne. Navê Bakûyê çawa bajarê neftê li dinyayê eyane. Li Bakûyê gellek mekteb, institût, tîatr, muzey hene. Li Bakûyê azêrî, rûs, tatar, kurd, talîş, lezgi û gellek mîletê mayîn dijîn. Ev mîletana mîna neferê malekê dijîn û tevayî kar dîkin.

DERSA 47-a

AZERBAÏCAN

Li dilê min tu qudretî,
Nûr-semala dinê ketî,
Tu gulistan, tu cînetî,
Azerbaycan, Azerbaycan!

Pembû, nefta te zêrê zer,
Rewşa teye bedew Xezêr,
Li te zevî, rez bûne ber,
Azerbaycan, Azerbaycan!

Dînya-elam dîsk dizane
Kurd, azêrî du birane.
Bextewarî, bi te şane,
Azerbaycan, Azerbaycan!

Egîrê QADIRI

DERSA 48-a

SALEKÊDA ÇEND MEH HENE

Roj û şev pey hev tîne û diçin. Her pojeke derbazbuyî emrê me 24 seheta zêde dike. Lê emrê meriv rojanva ne, salanva tê jîmarê. Lema jî dibêjin: "Tu çend salîyî?"

Salêkêda 12 meh hene. Navê wan mehan evî: çîleyê paşîn (yanvar), sibat (fêvril), adar (mart), nîsan (aprêl), gulan (may), hezîran (iyûn), tîrmeh (iyûl), tebax (avgûst), îlon (sentyabr), çîrîya paşîn (oktyabr), çîrîya paşîn (noyabr), çîleyê paşîn (dêkabr).

TÊDERXISTINOK

Sêsid gîşt pênc reşêlek,
Donzdeh ga, çar çêlek,
Nîvî reşin, nîvî belek.
Ew çîye?

DERSA 49-a

ROZGARÊN SALÊ

Çar rozgarên salê hene: bahar, havîn, payîz, zîvistan.

Her rozgerek sê mehî: Adar, nîsan û gulan mehê baharêne. Hezîran, tîrmeh û tebax mehê havînêne. Mehê payîzê evî: îlon, çîrîya paşîn, çîrîya paşîn. Zîvistan jî sê meha dîkîne: çîleyê paşîn, çîleyê paşîn û sibat.

Baharê her alî hêşîn dibe. Bax û baxçe kulîkên spî, gevez, qîçîk û sûtva dixemîlin. Roj hêdî-hêdî dirêj dibe.

Havînê kulîkên bax û baxçe dibîne rez. Payîzê roj hêdî-hêdî kîn dibîn. Zû-zû baran dibare, ba tê, belgê daran diweşin.

Zîvistanê her alî, dest û zozan bin berfêda dimînin. Roj kîn, şev dirêj dibîn.

Baharê sal dîsa nûh dibe.

Sal mîna bawîşka tîne û diçin.

DERSA 50-i

QULING

We li hewa gîrtîye rêze,
Per vedîdî jor û fêze.
Li esmana tev dîgerin,
Ser çîyara weldîgerin.

Hûn xerîbîn û dîlxedar,
Xweş bona we her bahar.
Hîvîya wene gul-gulistan,
Dest û zozan, mîrê û çîman.

Hîvîya wene gul û rihan,
Werên lê wan bîbîne mîvan.
Ez dibêjim bi ruh û can,
Pîrskî halê Feqîyê Teyran.

Feqîyê TEYRAN

DERSA 51-ê

KURÊ BÊXÎRET

Mêrekî kal hebû. Îdî kar pê nedibû. Rojekê kurê wî kalî jê bîzar bû. Kur bavê xwe kîre sebetekê û bir danî serê çiyakî, ku gur bixwun. Wextê kur ew danî erdê û zivirî here mal, kalê gotê:

-Lao, te ez anîme vîra, ew suxulê teye, lê sebeta xwe hilde bîve mal, wê rokê lazîmî tebe.

Kur pîrî:

-Bavo, sebetê bona çî lazîmî minbe?

Bavê wî got:

-Tu kal bûnê kurê teyê jî te pê bîne vîra.

Kur poşman bû û bavê xwe hilda anî mal.

Kur hene-gula bavê xwe,

Kur jî hene-kula bavê xwe.

(Peyhatin rûpêlê 4-a)

(Destpêbûn rûpêlê 3-a)

DERSA 52-a

NEVROZ

Nevroz sersala meye,
Edet û ola meye.
Biçûk û mezinê me,
Dibêjin îdî deme.
Diçîne sersala hev,
Diçîne li mala hev.
Sersalakurdanpîroz,
Ewe cejna me Nevroz.

Qadri CAN

DERSA 53-a

CÎRANTÎ

Maleke dewletî hebûye. Rokê xweyê malê jina xwera dibêje:

-Van cîrana ebûra me birine. Çiyê wan kême, tîni ji me dixwezî. Were em ji vîra barkin, herin cîkî dîr, bila kesek dora me tunebe.

Jina wî dibêje:

-Tu rast dibêji. Lê çî rokê yek tî derziyê dixwaze, yek tî elekê dixwaze, yê mayîn tîni tîstekî dinê dixwazî. Ez qalim, rabe em barkin.

Ewana bar dikin û diçîn...

Rokê payîzê mîrîk genim dadigire, wekî here êş. Ew gazî jînê dike:

-Ca biçûnê bîne, devê çewalan bîdîm.

Jina wî malê digere-nagere biçûnê nabîne û tî mîrê xweradibêje:

-Biçûna me unda bûye.

-Unda bûye, here ji mala cîranekî bîne.

-Ka cîranêd me, mîrîk?

Wê şûnda ew mala xwe bar dikin û tîni cîyê xweyî berê. Cîranê nêzik ji birayê dîr çetire.

DERSA 54-a

MÎR Î NÊÇÎRVAN

Rokê mîrê Botan bi çend siyaranva derketibû gerê. Ewana nêzikî çiyakî bilind bûn. Mîr nihêrî, ku xortek li ber kevîrê mezîna rûniştîye. Mîr ji xort pîrs kir:

-Xortê delal, tu li ber vî kevîrî çî dikî?

-Ez nêçîrvanîm.

-Lê tîfînga te kanî?

-Ez kewa raçav dikim.

-Tuyê bî tîfîng kewa bigirî?

-Kewamîn heye.

-Çawa tuyê bî kewê kewa bigirî?

-Mîn dav dora wî çêkirîye. Kewê mînî wê bike qive-qiv, kewê bîni û bikevîne davê. Ezê wan bigirim.

Mîr şûrê xwe derxist û kewê kerî-kerî kir û gote hevalêd xwe:

-Ew kesê ku heval û hogirê xwe dike dava dijîmîn ez hez nakim. Heqê wî kesî tenê kuştîne.

Kî gorî hevalara vedide-xwe dikeve.

DERSA 55-a

DÎLÊ BAVÊ

Rojêke zivistanê xortek derketibû derva, berfa ber dêrî paqîş dikir. Bavê wî çiqasî gotê sare, werê hundur, kur gurra bavê nekîr. Lema ji bavê xort çû neviyê xwe pêçekêda anî danî ser berfê. Xort ev yek dît, bi lez çû kurê xwe hilda û got:

-Bavê, tu çî dikî? Ne wê bicemide.

Bavê got:

-Lawo, dinihêrî, ew kurê teyê dilê te lê dişewite, ne tu ji kurê minî. Dilê min ji bona te dişewite.

FERHENG KURDÎ-AZERÎ

al - bayraq	kişik - şahmat
ax - torpaq	lan - yuva
bahîv - heyva	lîva - guzəm
beq - qurbagça	mor - bənövşə
beraz - qaban	nefi - surgun
bersiv - cavab	paqîş - təmîz
bivir - balta	suk - bazar
vizik - eşşek arısı	sûr - çəpər
gel - xalq	sûs - bîyan
dav - tala	fêkî - meyve
dîrok - tarîx	fîq - tutak
zaro - ûşaq	çam - şam agaci
zebeş - qarpîz	cejn - bayram
zerdele - erik	cîran - qonşu
kem - zoğ	co - arx
kêr - xeyir	êzing - odun
kund - bayquş	wêne - şakil

PE'S'GOTIN DERHEQA XALI U' HU'R-HU'NANE'N KURDAYE BI DERST

Meriv meheke', yani saleke' li wareki, ciki mane' li wîr heq-neheq naveki, nis'aneke' dihe'le. Le' gel li welateki, ser erdeki bi hezar salan mane' pey xwe nexs'-nigare'n usa dihe'le, weki pas'e' tu sal u' qurne nikarin wana xirab bîkin.

Gele' kurd di dewra hebu'na xweda, heta naha pey xwe r'ec'eke usa his'tiye, weki iro meriv seranser Kurdîstane' geriyane', ser bajar, gund, kela, pîre'n ku li wîr hatine c'e'kirine' ece'bmayî dîmine. Iro tu li ber kele'n Xos'ave', Diyarbekirê, Bitlisê, hewle're' sekinine', nîhe'rîne' alîkîda hejmeke' dîminî, weki iro tu kes kelake usa nîka-

kurda rind nas dikin ve' xezîne' tu cara tev nexs'-nigare'n gele' dîn nakin u' qîmete' he'ja dîdine ve' hebu'ne'; cawa dibe'n xulqare' van nexs'-nigaran tînine ber c'avan.

Aha derheqa van pîsanda pîrtu'ka Wîlyam Iglîtone (William Eaglton) "Pe's'gotin derheqa xali u' hu'r-hu'nane'n kurdaye bi dest", ku sala 1988-a li Londone' bi zîmane' Ingîlîsî hatîye wes'andin. Çiye be'jîn, weki derheqa kurdada eva pîrtu'ka Iglîtone dudaye. Pîrtu'ka wiye pe's'in ya "Mahabad sala 1946-a" ye.

W. Iglîton sala 1954-a li Kirku'ke' c'awa serwe're' c'anda navgîna Ame'rikaye' Dîxebîte. Wexta ew bi xîzmet temamiya Kurdîstane' digere bi erf-edet, destemeliya vi gele' me'vanhîza, bi c'anda wîra dibe nas. Pas'westiye' dînivîse, weki derheqa vi gelîda pîrr ke'm hatîye nîvîsar u; lema ji pîrtu'ka xwe nav dîke "Pe's'gotin". Xwedannivîsî bi ve' yeke'va dîxwaze be'je, weki eva pîrtu'ka ewlîne, gîlîye' pe's'ine derheqa destemeliya kurdada. Pey ve' pe's'gotîne' dîsa pe'wîs'te vegerîne ser pîrsa vi gelî. Pîrtu'ka xerxwaze' gele' kurd W. Iglîton "Pe's'gotin derheqa xali u' hu'r-hu'nane'n kurdaye bi dest" ji se' para hetîye amade kirin.

1. Gel u' dirok:

a) gele' kurd

b) diroka kurd.

2. Ber u' qebîl:

a) qebîle'n kurde'n Irace'

b) qebîle'n kurde'n Irane'

c) qebîle'n kurde'n Tîrkiye'

3. Pe's'gotin derheqa xali u' es'yaye'n dîne bi dest hu'nayî:

a) Tîs'te'n bi dest hu'nayî-ye'n kurde'n Irace'

b) Tîs'te'n bi dest hu'nayî-ye'n kurde'n Irane'

c) Tîs'te'n bi dest hu'nayî-ye'n kurde'n Tîrkiye'

Di ve' pîrtu'ke'da W. Iglîton bi hu'r-gîlî derheqa gele' kurd, diroka wiye qedîmî gîrî heta roja iro, derheqa heleqetîye'n c'anda kurdan u' asu'rîyan u' usa' ji derheqa babîllone' s'îrovedîke.

Di nîvîsara xweda ewl usa' ji derheqa c'anda kurdaye îroyîn li her c'ar perç'e' Kurdîstane' u' kurde'n Sove'ta bere' daye klvs'e'.

Ew dînivîse, weki hînek senetzanê' dunyaye' xali u' palase'n kurda s'as' texmîn dikin. Gellek xaliye'n ku ewana bîn nave' "Karabax", "Hemedan", "Ermenîstan" dîdine klvs'e' pîrranîya wan nexs'e' kurdanîn. Ev tîs'tana gotî rast be' ne texmîn kîrîne'. Ew dînivîse gotî hetanî nexs'e' kurde'n Sove'te' ji bîn nave' ermenî, gurcî, azêrî, turkme'n u' gele'kafkaze' neye'ne dayîne'. Ev kîrînana bextîye mîqabîlî gele' kurd. Dîroke' c'îqasî pas'epe'î dîdî klvs'e', wede bi xwe zû, yane' dereng wan s'as'îya rast dîke.

Iglîton dîroke' u' tîs'te'n bi dest c'e'klîrî hîmberî hev dîke. Cîkî ew dînivîse, weki hîne kurd di qurna XVII bi destê S'ah Abbas hatîne nefîkîrîne' u' naha li Xorasane', du'rî Kurdîstane' dîjîn. Ewana bi zîmanekî ne'zîkî farsî u' tîrkî xebêrdîdîn. Hînek dîbe'jîn, weki ewana ne kurdî. Le' wexta em nexs'-nigare'n wan u' ye'n kurde'n Kurdîstane' dîjînhîmberî hevdu bîkîn eme' bîvînin, ku evan nexs'ana s'edetîya here mezîn dîdîn, weki ev kurde'n Xorasane' refeke teyre'n ji wele't qetyayîne. Gellek sedsale' dabîrîn, le' dîsa nexs'e'n ku bi destê jîne'n kurd hatîne c'e'klîrîn ji hevdu cuda nabîn.

Pîrtu'ke'da gellek tîs'te'n mayîne bi hewas ji hene. Kutasiye'da 150 we'ne'ne' emenî u' xalîc'eye'n kurda, ye'd bi rengî dane, kîjan he'ja bu'na pîrtu'ke' daha ze'de dîke.

Ev pîrtu'ka ne tene' boy senetzanan, le' usa' ji boy dîrokzan, zîmanzan, e'tnograf u' sosîologan kanîyeke nemlîc'îqîye.

TAMARA REFO.

AN INTRODUCTION TO
KURDISH
RUGS
AND OTHER WEAVINGS

WILLIAM EAGLETON

SCORPION PUBLISHING LTD

re c'e'ke, aliye' dînda ji ewqasî kubar dîbî, ku tu ji endamekî wî geliyî—kurdî.

Nexs'e'n vi gele' kevn ne tene' li ser kevîrane, le' usa' ji li ser emenîyan, carclman, farmas'an, te'rran, c'ewalan, xurcan, berxurcan, cîllan, werîsan, goran, mendîlan, libasan u' ye'd mayîndane.

C'î ji bîn destê jîna kurd derketîye, ewe' c'î hu'naye, navekî ji le' kîrîye, meselen: gore' "perik", "plis'tawe", "sosin", nexs'e'n "rîzdlîk", "nîk", "qazîmî", "îzollî", "heste", "dîranok", "kerik", "neynu'ka ke'leka", "delru'vî", "nexs'a nîka jînbêrdayî". Dîbe'jîn, weki xwede' gîravî, jîna ku ew nexs'a nîkarîbu'ye c'e'ke, me'r ewa berdaye.

Jîne'n kurd libase'n xwe-xwetîye' ji xwera dîru'ne u' nave'n anegor ji le' kîrîne: "De'hre' qutnî", "kaftîye' gulafu'na" u' ye'd mayîn.

Xalîc'e u' palase'n ku bi destê jîna kurd hatîne hu'nandîn senetzanê' dunyaye' heyr-hej-makar his'tîne. Xaliye'n Senendeje', Mosule', He-karîye' dunyaye' dîgerîn, mu'ze'a u' male'n kole'ksîoneran dîxemlînin.

Le' sed mîxabîl, ev nîmu'ne'n ku bi destê jîna kurd hatîne c'e'klîrîn heta naha qîmete' xweyî he'ja nedîtîne. Gellek caran ev nexs'ana ser nave' mîlete'n dîn te'ne navkîrîn u' xweye' wanî hîmîlî ji meydane' derte'. Ev gls'k ru'ye' we' yeke'da pe's'da te', weki dewlîwta vi gelî tune, lema ji hîm hebu'n, hîm erf-edet, mîqam u' kulame'n we'hîm zargotîna we' dîbîne hebu'n u' mîlîke' gele' mayîn. Le' ew ulmdar, le'gere'n ku

RE'DAKTOR AHMEDE' REPO

ENDAME'N RE'DAKSIYAYE'

Adile' CEMAL

(dewsgîrtîye' re'daktor)

Baxîs' HUSE'YNOV

Bayrame' FETI

E'mîra HESENOVA

Huse'yn KURDOGLI

Kamîle' EKBER

S'amîle' SELIM

S'amo ARIF

Rojname li komîte' ta wes'andîna

Dewlete' ya Re'spu'bîlîka

Azerbaycanê' hatîye klvs' kirîne'.

Destu'rname N 291

Indeks: 66976

Gîjmîti 2 rubl.

He'ja 2 rubl.

Navnîs'anare' daksîyaye': 370604

Baku, soqaga Gara S'ehera 7-a, 35

Упаа: 370604, Баку, 7-я Гаpa Шейар кучасы. 35

Адрес: 370604, Баку, ул. Черногородская, 35

Rojnamebî kampu'te're' te' berevkîrîn u'

li' o'apxanane's' rîyata

Azerbaycanê' te' wes'andîna

tembe: 6187

Jmar: 2743